


# Deykbîna ‘Îsayê Mesîh

Eve ye ka çawa ‘Îsayê Mesîhî hatî ye dinyayê: Deyka wî Merîem ya bu Yusivî meherkirî bî. Ji berî ku ew her dû bigehine êk, hate dîtin, ku Merîem ya ji Gîanê Pîruz bi tişt e. Belê çunku Yusivê dezgirê wê miruvekê rast bî u ne divîa hetka wê bibit, îna brîar da bi dizîkî ve ber bidit. Belê demê hizir di vê çendê da kirî, frîştekekê Xudanî bu wî di xewnê da dîar bî u gutê: “Yusivê



kurrê Daûdî, tu ji hindê ne tirse, ku Mirîemê wek jina xu bibîe

mal, çunku ewê di zikê wê da ji Gîanê Pîruz e. Dê wê kurrek bit u dê navê wî kite ‘Îsa, çunku ew dê milletê xu ji gunnehêt wan qurtal kit.” Eve hemî hate ruîdan da ewa Xudanî li ser zimanê pêxemberî gutî bi cih bêt: **<Dê kiça kiçin bi tişt kevit u kurrek dê bit u dê bêjinê ‘Emanuîl>** u ramana vî navî dê bit jî: “Xwidê digel me ye”. Demê Yusiv ji xew rabî, wî ew kir ya frîşte Xudanî fermana wî kirî u Merîem weku jina xu bire mal. Belê ew ne çû nivîna wê heta kurrek bî u navê wî kire ‘Îsa.



## Seredana Stêrnasa

Piştî ‘Îsa li Beytlehim peyda bî li devera Yehudîê li serdemê paşa Hîrudêsî, hindek stêrnas ji layê

rojhelatê ve hatine Urşelîm u pisîar kirin: “Kanê ye Paşayê Cihîya yê ji deyk bî? Çunku me stêra wî li rojhelatê dît, vêca em yê hatî xu bu biçemînîn.” Demê Hîrudês Paşai eve guh lê bî ew u hemî xelkê Urşelîmê têk çûn. Îna wî hemî serukêt qeşet Cihîya digel mamostayêt desturî kûmkirin u jê pirsî: “Mesîhî dê li kêrê ji deyk bit?” Îna wan bersiv da u gut: “Li Beytlehim li Yehudîê, çunku husa ya li ser zimanê pêxemberî hatî ye nivîsîn: <U tu ey Beytlehîma> li devera Yehuda, <Qet li nav serukêt Yehuda ne ya kêrê, çunku dê ji nav te serukê çavdêrîê li xelkê Îsraîlê dîkit derkevit.> Paşî Hîrudêsî bi dizîkî ve gazî kire stêrnasa u demê dîarbîna stêrê ji wan pirsî. Paşî virêkirne Beytlehim u gut: “Herin u baş li zarokî bigerin u demê hîn dibînin bêjine min da ez jî xu bu biçemînîm.” Demê wan guh daî ye paşai, ew bi rê ketin u ew stêra wan berî hingî li rojhelatê dîtî li pêşîya wan diçû heta li hindav wî cihî zarok lê rawesta. Demê wan stêr dîtî gelek u gelek keyf xuş bîn. U demê bi jur ketî wan zarok digel deyka wî Merîemê dît u wan xu bu çemand, paşî tuirkêt xu



vekirin u xelatêt zêrî u bêhinêt bixwîrê u murî pêşkêşî

wî kirin. U ji ber ku di xewnê da hatine agehdar kirin ne zivirine ve Hîrudêsî, ew di rêkeka dî ra berev welatê xu vegerrîane ve.

## Revîn Berek Misrê

Demê stêrnas çûn, frîştekekê Xudanî di xewnê da bu Yusivî dîar bî u

gutê: “Rabe u zarokî u deyka wî birevîne Misrê u li wêrê bimîne heta ez dibêjime te, çunku Hîrudês dê li zarokî gerît da bikujit.” Vêca Yusiv di wê şevê da rabî u zarok u deyka wî berev Misrê ve birin. Li wêrê man heta mirna Hîrudêsî, da ewa Xudanî gutî li ser zimanê pêxemberî bi cih bêt: <Min kurrê xu ji Misrê gazî kir.> Demê Hîrudêsî zanî stêrnasa tirane pê kirin, gelek turre bî u ferman da hemî kurrkêt Beytlehim u dewir u berêt wê yê ji dû salîê biçiktir bikujin, li dîv demê dîarbîna stêrê herweku ji stêrnasa zanî. Hingî ew peyva bi zimanê ermîya pêxember hatî ye gutin bi cih hat: <Dengek ji Rame hate guh lê bîn, hewar u nalîneka tîj! Raîhêl bu kurrê xu dikite girî u razî nabit dilê wê bête xuş kirin, çunku ew êdî ne man.>

## Vegerrîan ji Misrê

Piştî Hîrudês mirî, frîştekekê Xudanî di xewna Yusivî da li Misrê dîar bî u gutê: “Rabe zarokî u deyka wî bizivirîne ve devera Îsraîlê, çunku ewê hewildîn wî bikujin yê mirîn!” Vêca rabî zarok u deyka wî vegerrandine devera Îsraîlê. Belê demê guh lê bî, ku Erxîlaûs yê desthelatîê li ser devera Yehudîê şûna babê xu Hîrudêsî dîkit, tirsîa biçite wêrê u ji ber ku di xewnê da hate agehdar kirin, vêca çû devera Celîl u gehîşte bajêrê digutîne “Nasîre” u li wêrê xu cih bî, da ewa hatî ye gutin li ser zimanê pêxembera bi cih bêt: “Dê bêjinê yê Nasîrî.”

- ji Mizgînîa Mettî 1:18-2:23